

# Wêje û Rexne

kovara lêkolîn, rexne û teorîya wêjeyê

hejmar: 11 • sal: 2019 • bihar • havîn • payîz • zivistan •



"Mîrateya Hest û Hisan" û Bandora Welatê Xerîbiyê li Ser Mêjûya Zimên **Maria Six-Hohenbalken** ■ Asmên re Roz Vîneto, Yanî Çi? Welîyê Wuşênê Yimamî Çi Tîştî Fêrî Lêkolînerên Komkujiyan Dike? **Yektan Türkyilmaz** ■ Kalaşnikofi de Trawma û Şahidiya Qirkerdişî **Şenay Asutay** ■ Bi İbrahim Seydo Aydogan re li Ser Akademiyê Hevpeyvîn **Hevpeyvîn: Dawid Yeşilmen** Dahûrînek li Ser Romana Hewarî ya Heciyê Cindî di Peywenda Edebiyata Sirgûn û Şahidiyê de **Murad Celali** ■ Hêmanên Mitolojîk di Çîrokên Kurdî de **Cihan Kaynar** ■ Ji Hêla Temayê ve Lêkolîneke Berawirdî li Ser Helbesta Furûx Ferrûxzad û Jîla Huseynî **Şükran Yağuz** ■ Pergala Newasaziya Helbestên Kurdî -Pegaleke Kurdî ji bo Derxistin û Terxankirina Nêwa an Kêşa Helbestên Kurdî- **Îrec Mêhrbex** ■ Kurdistan ji Wêraniyê jî bi Wêdetir: Hevpeyvîn bi Bextiyar Eli re **Hevpeyvîn: Barbara Ciolli** ■

# SERÊ ŞEVÊ ÇÎROKEK SELÎM TEMO

DERKET



HEJMAR: 11 • SAL: 2018  
• BIHAR • HAVÎN • PAYÎZ • ZIVISTAN •

# Wêje û Rexne

KOVARA LÊKOLÎN, REXNE Û TEORÎYA WÊJEYÊ



**WÊNEYÊ BERGÊ**  
Walid El Masri

## WÊJE Û REXNE

Kovara Şeş Mehane ya Lêkolîn, Rexne û Teorîya Wêjeyê  
Weşana Demane (Du-demsalî)

Hejmar: 11 • Sal:2018 • Bihar • Havîn • Payîz • Zivistan •

■  
**ISSN:** 2148-2500

■  
**XWEDÎYÊ KOVARÊ:** Mehmet Sebih Yoldaş

■  
**EDÎTOR:** Davut Yeşilmen, Serdar Ay, Ömer Delikaya

■  
**LIJNEYA WEŞANÊ:** Filît Baran, Nurgül Ay, Sinan Gültekin

■  
**RASTKIRIN:** (Kurmancî û Zazakî): Ömer Delikaya & Filît Baran

■  
**ŞÊWIRMENDÊ HUNERÊ:** Ömer Delikaya

■  
**KARÊN ABORÎ-TEKNÎKÎ:** Bawer Berşev

■  
**BELAVKER:** Pirtûka kurdî • <https://www.pirtukakurdi.com>

■  
**BERG Û RÛPELSAZÎ:** Ridwan Xelîl | [ridwanxelil@gmail.com](mailto:ridwanxelil@gmail.com)

■  
**TÊBINÎ:** Mafê çapkirina nivîsaran, tenê di destê lijneya weşanê de ye. Lê nivîskar ji naveroka nivîsarên xwe berpîrsîyar in. Herweha nivîsên ku ji kovarê re têne şandin, neyêne weşandin ji li nivîskar nayêne vegerandin û bi şertê ku çavkanî bê nişandan, jêgirtina ji kovarê serbest e.

■  
**ÇAPXANE:** ALIOĞLU MATBAACILIK, Sertifika No: 11946, Orta Mh. Fatin Rüştü Sk. No: 1/3-A, Bayrampaşa/İstanbul Tel: 0212 612 95 59

■  
**ŞERTÊN ABONETIYÊ:** Bihayê kovarê ₺15 ye. Ji bo Ewropa jî €15 ye. Abonetiya ji bo salekê ₺40 û ji bo Ewropayê €40 ye.

■  
**HESABÊ BANQEYÊ:** İŞ BANKASI Diyarbakır 3. Sanayi Şubesi

**Xwedî:** Mehmet Sebih Yoldaş

**Hesap No:** 8306-0006720

**Iban:** TR19 0006 4000 0018 3060 0067 20

**Swift/Bic:** ISBKTRIS

**Western Union:** Mehmet Sebih Yoldaş

■  
**NAVNIŞAN:** Kooperatifler Mah. Akkoyunlu 4. Sk. Hukukçular Apt. No:1,  
Yenişehir/DİYARBAKIR

■  
**Tel:** 0533 307 5717

**E-Mail:** [wejeurexne@gmail.com](mailto:wejeurexne@gmail.com)

**facebook:** wejerexne

**skype:** wejeurexne

**twitter:** wejeurexne

**instagram:** kovarawejeurexne

---

# NAVEROK

---

**004-005 ..... Ji Editorîyê**

**006-025 ..... Maria Six-Hohenbalken**

"Mîrateya Hest û Hîsan" û Bandora Welatê Xerîbîyê li Ser Mêjûya Zimên

**026-046 ..... Yektan Türkyilmaz**

*Asmên re Roz Vîneto*, Yanî Çi? Welîyê Wuşênê Yîmamî Çi Tîştî Fêrî Lêkolînerên Komkujîyan Dike?

**0470-059 ..... Şenay Asutay**

*Kalaşnikofî* de Trawma û Şahîdîya *Qirkerdişî*

**060-074 ..... Hevpeyvîn: Dawid Yeşîlmen**

Bi Îbrahîm Seydo Aydogan re li Ser Akademîyê Hevpeyvîn

**077-094 ..... Murad Celalî**

Dahûrînek li Ser Romana *Hewarîya* Hecîyê Cindî di Peywenda Edebîyata Sirgûn û Şahîdîyê de

**095-119 ..... Cîhan Kaynar**

Hêmanên Mîtolojîk di Çîrokên Kurdî de

**120-132 ..... Şükran Yağuz**

Ji Hêla Temayê ve Lêkolîneke Berawirdî li Ser Helbesta Furûx Ferrûxzad û Jîla Huseynî

**133-146 ..... Îrec Mêhrbexş**

Pergala Newasazîya Helbestên Kurdî -Pegaleke Kurdî ji bo Derxistin û Terxankirina Newa an Kêşa Helbestên Kurdî-

**147-150 ..... Hevpeyvîn: Barbara Ciolli**

Kurdistan ji Wêranîyê jî bi Wêdetir: Hevpeyvîn bi Bextîyar Elî re

**151-151 ..... Hejmara 12an**

Mijar: Qonaxa Hawarê

# JI EDÎTORÎYÊ

---

*Silavên ji dil li ser we xwendevanên wêje û rexneyê be.*

Em keyfxweş û bi coş in ku hejmara nû ya kovarê li ber destê we ye.

Em wekî Kovara *Wêje û Rexneyê*, ji roja ewil heta niha di wê hewldanê de ne ku kovara me ji aliyê naveroka xwe ve çendanîyê li ber çavan bigire û ji mal û pencereya kurdî ve bibe platformeke rexne û teorîya wêjeyê.

*Wêje û Rexne*, piştî navberekê, vê biharê xwe digihîne ber destê we. Wekî ku li we jî eyan e, em di wexteke werê de ne ku kovarên kurdî ji bo berdewamiya weşanên xwe li ber xwe didin. Lêbelê, digel hemû zehmetîyan, kovara me nêt nîne ku ji barê kovareke rexnaya wêjeyî xwe dûr bixe. Li vir divê em piştevanîya aborî û teknîk ya Bawer Berşev ku yek ji damezrînerê kovara me ye û *pirtukakurdi* bi bîr bînin û spasîyan li wan bikin ku barê weşandin û belavkirina kovara me dane ser milê xwe.

Di hejmara berdest a kovarê de, me dosyayê li ser "tertele"yê da ber xwe û li gorî mijara dosyayê, ne gelek jî bin hin nivîs ji me re hatin. Divê em bêjin ku dosyeya ku me dixwest amade bibe ne bi dilê me çêbû ji ber kêmbûna nivîsan. Maria Six-Hohenbalken bi nivîsara xwe ya bi navê "Mîrateya Hest û Hîsan û Bandora Welatê Xerîbîyê li ser Mêjûya Zimên" tevkarîyê berbiçav pêşkêşî xebatên li ser "tertele"yê dike. Nivîskar dikeve pey dengê kesên ku endamên malbata xwe di şer


de winda kirine û dîtina wan a li ser komkujîyê di peywenda xebatên bîr û ziman, vegotinên malbatan û rûdanên dîrokî de dinirxîne. Yektan Tûrkyilmaz li ser vegêrana kilameke bîst risteyî dikeve pey hêrsdarîya sedsalekê, komkujîyekê û jîyana civakî; bi nêrîneke nû li şîdeta tomerî û sîyaseta bîr û nasnameyê dinirxîne ku gelek pisporên “xwedêgiravî” piştguh kirine. Şenay Asutay di romana Deniz Gündüz a bi navê *Kalaşnikof* li ser hêmanên trawma û şahîdîyê radiweste.

Heypeyvîna vê hejmarê, Dawid Yeşilmen bi Îbrahîm Seydo Aydogan re li ser akademîyê kir. Seydo, di hevpeyvîna xwe de li ser akademîya kurdî fikrê xwe tîne zimên û tecrûbeyên Inalcoyê bi xwendevanên me re parve dike. Murad Celalî, di nivîsara xwe ya li ser *Hewarîya Hecîyê Cindî* de bi nêrîneke li dor temayên edebîyata şahidî û sirgûnê romanê dinirxîne. Cihan Kaynar, bi nivîsa xwe ve, hêmanên mîtolojîk ên di çîrokên kurdî de lêdikole. Şükran Yağuz jî bi nêrîneke berawirdî ve temayên di helbestên Furûx Ferrûxzad û Jîla Huseynî dide ber hev û wekhevîyên balkêş destnîşan dike. Îrec Mêhrbexş pergaleke nû ya bi navê Newasazîyê berpêş dike û amaje pê dike ku ev pergal xweştir li bejn û bala kurdîyê tê. Me xwest bi rêya kovara me, ev mijar bi raya giştî re bête parvekirin û nîqaşkirin. Kurtehevpeyvîneke ku nivîskareke îtalî bi Bextîyar Elî re kirîye, ji îtalî bo kurmancî ji aliyê Selîm Nalî Gulfiraz ve hate wergerandin.

Wekî gotina dawî em dixwazin bibêjin ku kovara me wê ji vir û şûn de rastnivîsa xwe li gorî *Rêbera Rastnivîsînê* ya Komxebata Kurmancîyê dirust bike û nivîsên xwe li gorî wê sererast bike. Jixwe heta niha jî me çapa kevn ya rêbera navborî dişopand û heta ji destê me dihat me sererastkirinên xwe li gorî wê çêdikirin. Em di vê meseleya rastnivîsînê de, dixwazin hemû kovar û weşangerên kurmancî li gorî vê xebatê tevbigerin da ku aheng û lihevkirinek li ser bikaranîna zimên çêbe da ku hem karê redaksiyonan rihet bibin hem jî standardîzasyona zimanê me xurt bibe.

Bi vê daxwaza dawî, bi hêvîya hevdiîtineke din em xatirê xwe ji we dixwazin. Heta hejmarake din, bimînin di nav wêje û rexneyê de. Bi hezkirin.





### **Dımdım Kalesi**

*Erebê Şemo - Çeviri: Edîp Polat*


Dımdım Kalesi, 17. yüzyılda kale halkı olan Kürtlerin, Osmanlı ve İran ordularına karşı kendilerini koruma amaçlı savaşının tarihini anlatıyor. Kitap, kale halkının kendilerine sağladıkları güvenli ortamın, refah ve adaletli yönetiminin zalim ve kötü örnek despotların tahammülsüzlüklerine karşı direnişinin tarihi aynı zamanda. Kitap Edib Polat tarafından bir çırpıda ve rahat okunan bir üslupla Kürt Edebiyatını tanımak isteyen Türkçe okurlarına kazandırılmış.

*Şeyhmus Diken – BIANET*

Rûpel: 240

ISBN: 978-605-81248-9-9

Ebat: 13.5x21



### **Vîr û Warê Ma**

*Seîd Veroj*

Derheqê kultur û tarîxê mîrnişîniya Mirdasîyan de yew ceribnayîşê destpêkerdişî yo. Bi kemaneye bo zî, ena xebata verê destê şîma, seba ke biney roşnayîye bidewo tarîx û kulturê war û welatê ma, ameya amadekerdiş. Çimkî ca û welatê ma, tarîx de zaf qewm û medenîyetan rê bîyo ware. Hema zî hiş û vîrê şarê ma de, binê erdî û serê erdî de, kerre û tehtandê welatê ma sero şopê enî medenîyetan vinî nêbiyê. Ma biney şope biçarnê, biaşanê, bigeyrê cê, goşdarîya şarê mintîqa bikê û bala xo bidê folklorê înan, zaf çiyê balkêşî vejîyenê meydan. VÎR Û WARÊ MA, seba pêhesnayîş û vînayîşê çime û kultirê welatê ma, lilikêk nayo ma çîman ver. Ma, eno tarîx û kultir ra nesilyayî û ameyê resayê ewro.

Rûpel: 224

ISBN: 978-605-68620-3-8

Ebat: 13.5x21

**Kooperatifler Mahallesi, Akkoyunlu, 4. Sk  
Hukukçular Apartmanı, No:6 Diyarbakır**



[www.pirtukakurdi.com](http://www.pirtukakurdi.com)

[f/darayayinlari](https://www.facebook.com/darayayinlari)

+90 533 307 5717





# MÎRATA DEVKÎ YA ÇANDA KURDÎ

(Destan, Stran, Çîrok, Efsane û Metelok)

25 Cild

## ZARGOTINA KURDA

Enstîtuya Kurdolojî ya Vîyenayê (Aw-istiryayê) xebatên lêkolînî pêk tîne di warên wekî dîroka kurdan û rojhilatî, çanda kurdî, edebîyat, muzîk û hemû cureyên çanda folklorîk de. Enstîtuyê gelek cure pirtûk li ser çand, dîrok, edebîyat û muzîka kurdî weşandine. Bi saya serê van weşanên

xwe yê pir-cure, ew hêvî dike tevkarîyê li parastin û dewlendamkirina zimanê nivîskî yê kurdî bike.

Di sala 2014 de, enstîtuyê projeyeke berfireh a demdirêj da ber xwe: weşandina ensiklopedîya çanda devkî ya kurdî û muzîka gelêrî ku ji aliyê zimannas Prof. Dr. Ordixanê Celîl, etnologê dîrokê Prof. Dr. Celîlê Celîl û etnologê muzîkê Cemîla Celîl va şeş dehsalan li hemû parçeyên Kurdistanê û herwiha Sovyeta Kevn (Komarên Asyaya Navîn û Kafkasyayê) û li dîyasporaya Ewropayê hatine berhevkerin.

Enstîtu armanc dike ku hemû cureyên folklorê di nav xwe de bihewîne di 25 cildan de. (Format: 16x24 cm, bergê qalind; her cild 650 heta 730 rûpel digire; îlustrasyonên reş û spî û yê bi reng)

**Ji 2014an heta niha heft cild hatine weşandin:**

**Her sê cildên ewil (cild.1,2,3) Destanên Kurdî;**

**Cild. 8: Heyranok;**

**Cild. 9, 10: Çîrok, Çîvanok;**

**Cild. 13: Stranên Dîlanê, Govend, bi piranî notayan ve (herdu cildên ewil).**

Rêbaza akademîk a vê koleksiyonê û senifandina keresteyên devkî ku hatine nixrandin, li ser wan hatine şirovekirin û bi şewezarên kurdî ve hatine rengînkirin, ji bo lêkolînerên akademîk dikare bibe çavkanîyeke xurt.

Her yek ji cildan li gorî cureyên xwe hatine komkirin: helbestên destanî (qehremanî-evînî), stranên dîrokî, stranên evînê, zêmar, metnên devkî yê dînî yê êzîdîyan (efsane, mît, qesîde), metnên dînî yê îslamî, helbestên derwêşî û vegêranên qehremanên mîtolojîk, bo nimûne Ristemê Zal, çîrokên perîyan bi temayên eşq û mûcizeyî, fabl, henek û meselok, gotinên pêşîyan, biwêj, tiştanok, stranên dîlanê û xebatê, lorî û qurwelk (childrenverses) û hwd.

Ji bo her cildekê pêşgotineke berfireh û gelek parçeyên muzîkê hatine pêşkêşkirin bi tevî notayên wan.

Cild bi zaravayê kurmancî bi tîpên latînî hatîye amadekirin. Her yek ji wan îndeksa peyvan, bîbliyografiyeke berfireh a şirovekirî û bi tîra xwe wêne û nexşeyan dihewîne.

Herdu cildên dawî îndekseke peyvan ya hemû cildan û bîbliyografiyeke berfireh û şirovekirî dihewîne.

Bihayê her cildekî: 50 Euro.— bi tevî mesrefên posteyê)

Adresa siparişê: [ikw@kurdologie-wien.at](mailto:ikw@kurdologie-wien.at) or [birgitcerha@yahoo.de](mailto:birgitcerha@yahoo.de)  
Tel: 0043/277342555 an jî 0043/6767937374  
Institut für Kurdologie, Bergstrasse 42,A-3032 Eichgraben, Austria